Be Soranî.... Hengawêk bo pêşewe

Danpênan

Nûsînî: Dîno Potzatî
Wergêranî: Zana Q. Dizeyî

Xatû Lawra Pawla be êş û janewe leser çiwarpayekey rakişabû, pizişkeke pêy gût: hiç cêy bayexdan niye, meseley sê ta çiwar roje. Mawek bû Lawra Pawla bedest em core nexoşîye wereshênanewe deynaland, belam xanewadekey nîmçe galteyekyan pê dekird û cextiyan le rarayî ew dekirdewe, herweha pizişkeke pêy gût ke be hîç şêweyek nabê xem bixwat.
Diway nîwero bû, katêk Lawra Pawla rakşabû û xewtibû, nokerekey pêy rageyand ke qeşe Kwartzo geyişt, qeşey ew dêrey nizîk koşkî firansîskan, ew koşkey berdewal Lawra Pawla bo danpênan deçû bo ewê.. êsta çî hênawîtye êre?

- **((roj baş kiçe be nirxekem)) qeşe Kwartzo le katî hatine jûrewey emey gût.le geştêkim da bo beser kirdinewey mindale bestezimanekanimda bûm lêrewe têperîm û be bîrim da hat ke le dergay toş bidem. Pêyan gûtim ke to... belam aya emane cêy rarayîn: helse. Dey helse. Wek kçêkî zîrek, demewê sax û wek caran rû geş bitbînim, xanmêkî modêrin û çalakî wek to?... belam berast...hoy çiye ke ew pîre jine rûxoşey ke hemû car dergay lê dekîrdimewe lêre nemawe?**
- **((basî ewim bo meke bawke)) lawra pawla gûtî, ((zor pîr bûwe û îtir ştêk tê nagat, debwaye berêy bikem)).**
- **Çend salbû legelit bû?**
- **Kê eme dezanê?! Lewetey le dayik bûm, hemîşe le malda bînîwme, be birway min çendîn sal pêştir lêre bûwe.**
- **Be rêt kird?**
- **Ey demtiwanî çî bikem?bê gûman, bawkî azîz, em male penagey pekkewtûwan nîye.**

- **Lewe têdegem, têdegem "qeşe Kwartzo gûtî" belam kiçe biçkolanekem, em hawîne çît kird?**
- **Lawra Pawla destî kird be gêranewey çîrokekanî hawîn, derbarey geştekey bo ispanya û pêşbirçêy "ga"yekan û ahengî şû kirdinî kiçe mamekey şe le şarî Eritzo dadenişt, înca geştî deryayî naw keştî berew başûr ta qûbrîs û enadol.**
- **Pêşbînî dekem ke hawrêyetîyeke xoş bûwe...**
- **Bê gûman bawkî azîz, ême heşt kes bûyn, pêt nalêm çi rojanêkman beser bird, çi xoşîyek jiyain, çi xorêk hewesman pêy kird, hergîz bew aste ramnebiwardiwe.**
- **Awa, mêrdeket le kotayî da tiwanî kemêk pişû be xoy bidat, wa nîye?**
- **Ah, na. Mêrdekem bergey bînînî derya nagrê, karî zorî hebû, îtir nazanim çi kongireyek le firensa û swîsra?!**
- **Ey mindalekan?**
- **Oh, biçkolekanim! Le xwêndinge nêwxoyîyekeyan le swîsra manewe, ewê beheştêkî rasteqîneye, eger dezanî, bo ewan le bakûr be drêjayî sal pişûwe.**

Qisey kird û qisey derbarey koşke tazeke kird le nawçey "Borto Erkula" û wanekanî "yoga", aya dezanî bawke ke ême be rûh hest dekeyn gorawîn.

Geçtî dahatûş berew "Sas vî" debêt ke diwayîn heracî tablokanî lê berêwe deçê, qisey kird ta gonakanî sûr dageran û tirûskanewe.

Qeşe Kwartzo daniştibû gwêy lê degirt, wek bitêk lewê be çespawî maboyewe û îdî bizey nedehatê.

- **"kiçî xom" le kotayîda pêy gût "be pêy pêwîst qiset kird û namewê leme zîyatir xot mandû bikeyit".**

Be hêwaşî helsayewe " êsta bexşînit pê debexşîm".

- **çî?!**
- **Ewet nawê kiçî xom?**
- **Oh na bawke.. na belam sûpas.. belam tênagem!.**
- **"benawî bawik û kûr..." qeşe Kwartzo destî kird be gûtnewey be rûwe birindekey û beheman şêwe Lawra Pawla pencekanî destî le yek helkêşabûn.**

Bem core Lawra Pawla zanî ke norey mirdinî hatuwe.